

KURDÎ

The Hall

SÊVA MÊXEKRÊJ

► **Dibe ku piştî vî şerî
Welatekî bi navê
Ûkraynayê nemîne!**
Salih Kevirbirî

► **Hevpeyvîn
Bi Hunermend
Seywan Saedian Re**
The Hall Kurdî

Newroz ◀
û Sersala Dil
Necat Zivingî

Govend London ◀
The Hall Kurdî

Mirovahî Gerdûna ◀
Xwe Diafirîne:
Metaverse
DigiKurd

TheHallkurdî
E-kovara çandî ya mehane
Hejmar 3, Adar 2022

Damezrîner

Osman Kômürcü
Erol Başak

Editor

Erol Başak

Rûpelsazî

Ridwan Xelîl
ridwanxelil@gmail.com

Bergsazî

GrafiKURD

Navnîşan
London UK

The Hall Kurdî

Endama Koma
Kovargerên Kurd e

www.thehallkurdî.com


thehallkurdî@gmail.com

+44 7915 413436

@KurdîHall

TheHallKurdî

The Hall Kurdî



*E-kovara The Hall Kurdî hesas e ku kovar di wextê xwe de bê weşandin.
Ji fikrên di gotaran de hatine parvekirin û ji rastnivîsa wan nivîskar bixwe bersivekirin
û ne mecbûr in ku ew mîna yê weşanger û editor bin. Hemû gotar, nivîs, pêşgotin, reklam,
materyal û naverokên din bi niyetêke safî hatine amadekirin.*

NAVEROK



Nameya Edîtor ► Erol Başak

Merheba xwînerên hêja û dildarên zimanê Kurdî.

Sibatê ji me xatir xwest û herwiha em ketin meha ewil ya biharê. Bi hêviya bihareke xweş û rengîn ku bi xwe re aşîf û aramiyê bîne hemû dinyayê. Kerem bikin bi hev re em The Hall Kurdî bixwînin... ► Rûpel 4



Dibe ku piştî vî şerî
Welatekî bi navê
Ûkraynayê
nemîne!

Salih Kevirbirî
5



Govend London

The Hall Kurdî
23



Hevpeyvîn
Bi Hunermend
Seywan Saedian Re

The Hall Kurdî
9




Bêdarhiştinê
Bandoreke Çawa Li
Ekosîstema Bakurê
Rojhilata Sûriyê
Kiriye?

Daleel Hagy
27



Valentina Kurdî:
Sêva Mêxekrêj

Ridwan Xelîl
17



Mirovahî Gerdûna Xwe
Diafirîne: Metaverse

DigiKurd
31



Newroz
û Sersala Dil

Necat Zivingî
20



Pêşnûmaya Aştîyê(2-3)

Zana Zengenî
36

NAMEYA EDÎTOR

EROL BAŞAK

Merheba xwînerên hêja û dil-darên zimanê Kurdî.

Sibatê ji me xatir xwest û her-wiha em ketin meha ewil ya bi-harê. Bi hêviya bihareke xweş û rengîn ku bi xwe re aştî û aramiyê bîne hemû dinyayê dixwazim dest bi nivîsa xwe bikim.

Hejmara meha Adarê jî derket. Di meha çûyî ango meha Sibatê de rojek heye ku li seranserê cîhanê ji bo her kesî rojêke taybet e. Ew roja watedar bêguman 14ê mehê roja hezkiriyan e. Li Londonê, me jî roja Valentînê bi çalakiyekê pîroz kir. Lê bi awayî Kurdî. Di çalakiya bi navê Valentina Kurdî de me Sêva Mêxekrêj da nasîn. Û me digel beşdarên jî sevên xwe bi mêxekan xemiland. Ji bo hevkarîya wî em spasiya xwediyê projeya Sêva Mêxekrêj hunermend Seywan Saedian dikin. Hêvîdar im ku ev çanda delal li cîhanê belav bibe û mîna gulên sêva mêxekrêj jî li dinyayê wek remza evîn û aşitiyê bê nasîn.

Dîsa me bi hunermend Seywan Saedian re derbarê Sêva Mêxekrêj de hevpeyvînek kir. Mamoste Seywan bi berfirehî qala vê çanda qedîm kir. Hûn ê di vê hevpeyvînê de bibînin ka ew çawa hay ji Sêva Mêxekrêj bûye. Gelo ev çand tenê li Rojhilat hebûye an na? Di helbestan de

Sêva Mêxekrêj çawa derbas bûye? Ji bo nasandina vê çandê wî çî proje amade kirine? Çend ji wan çûne serî, çend ji wan nivco mane?

Bi hatina biharê re sal jî temam dibe û sala me ya nû bi Newrozê destpê dike. Nivîskar Necat Zivingî ji bo vê hejmarê gotareke bi navê “Newroz û Sersala Dii” nivîsî. Mamoste Zivingî dê we bibe demên xweş û geş, behsa Newrozên berê bike. Ew demên ku xelk di Newrozê de li deşt û zozanên Kurdistanê diçûne ger û seyranê. Binêrin ka keç û xortên Kurd di Newrozê de çî dikin û wê rojê çawa pîroz dikin.

Di rojên dawin ya meha Sibatê de Rûsyayê êrîş bir ser welatê cîranê xwe Ûkraynayê. Şerê li wir niha ji bo hemû cîhanê û mirovahiyê metirsî ye. Rojnameger û nivîskar Salih Kevirbirî ji bo The Hall Kurdîyê Şerê Ûkrayna û Rûsyayê nivîsî. Salih Kevirbirî di gotara xwe de bi lêkolîneke berfireh behsa rûdanên piştî hilweşîna Yekîtiya Sovyetan dike û sedemên şerî yek bi yek bi zelalî radixe ber çavan. Wekî ku di nivîsê de jî kifş e lazim e ev şer ne ji aliyekî ve lê ji hemû aliyên ve (Ûkrayna, Rûsya, Nato, Yekîtiya Ewropayê hdw.) bê nixandî û şîrovekirin da ku mesele zelal bibe.

Projeya Trees Against Poverty ku armanc dike li Sûriyê û Iraqê dar biçîne û bi vî awayî xwezayê hêşîn ava bike û herwisa alîkariya penaberan bike, di vê hejmarê de berdeyam tê vegotin. Damezrînerê projeyê Daleel Hagy û Dîrektor Ali Osman behsa polîtîkaya bêdearhîştina Bakurê Rojhilata Sûriyê dikin û dibêjin di encama wê de jîngeha heywanên kovî tune bûye. Bi vê projeyê hêvî dikin ku ew ajal dê vegehin warê xwe.

The Hall Kurdî di meha Sibatê de bi berga NFTê belav bibû. Wek berdewamiya vê mijarê me di kovara Adarê de behsa metaverseyê kir. Di gotara “Mirovahî Gerdûna Xwe Diafirîne: Metaverse” de bi zimanekî zelal ji van pirsan re bersiv tînin dayîn: Metarvere çî ye, bi kêrî çî tê?

Kovara me bi wergereke helbestvan Zana Zengenî diqede. Pêşnûmayê Aştiyê, helbesta Qeyser Emînpûrê Lorî ye û Zana di sala 2016an de ji Farisî wergerandiye Kurmancî.

Ez dixwazim bi mizginiyekê dawî li nameya xwe binim. Malpera me thehallkurdî.com temam bû. Edî dê hemû hejmarên kovara me, nivîs û hevpeyvînên me di malpera me de bêne belavkirin. Di demeke nêz de ji xeynî nivîs û wêneyan em ê vîdeoyan jî li malpera xwe bar bikin.


Bimînin di xweşiyê de.

DIBE KU PIŞTÎ VÎ ŞERÎ WELATEKÎ BI NAVÊ ÛKRAYNAYÊ NEMÎNE!

SALIH KEVIRBIRÎ
ROJNAMEGER Û NIVÎSKAR
salihkevirbiri@gmail.com



Şer malwêranî ye!





Şer malwêranî ye!

Bi xwe re derbederî, penaberî, koçberî, talankerî, birîndarî û qetilxwîniyê tîne. Rûxandin hêsan e, lê avakirin gelekî zor û zehmet e. Di dema nivîsandina van hevokan de, li bakurê Behra Reş ango li rojhilatê Ewropayê dengê zengilên şer bilind dibûn, hê ji vê gavê ve li gorî ragihandina rêveberiya herdu aliyên bi hezaran kes jiyana xwe ji dest dabûn, bi hezaran birîndar hebûn û bêhtirî milyonek kes welatê xwe terikandibû û terkiserê dinyayê bibû. Cara yekê ye ku mirovahî hewqas nêzîkî Şerê Cîhanê Yê Sêyemîn bûye. Ji niha ve tirs û xofa cîhanê, şerekî mezin ê nûkleer û balîstîk e.

Şerê Ûkrayna û Rûsyayê, bi gotineke rastir êrîş û dagirkeriya Rûsyayê ya li ser Ûkraynayê xwediyê paşxane û rabirdûyeke dûvedirêj e. Bi kêmasî nêzîkî 20 sal in ku acizî, xemxurî û nerazîbûna Rûsyayê li dar e.

Li gorî Putin Sedema Şer a Bingehîn NATO ye

NATO ango Rêxistina Peymana Atlantîka Bakur, sala 1949ê li dijî Yekitiya Sovyeta Sosyalîst hatibû avakirin. DYA, Kanada û 12 dewletên avakar ku tevahiya wan li Ewropayê bûn bingeha ve dezgehê danî. Sala 1952yê Tirkîye û Yewnanîstan tevli vê komê bûn. Sala 1982yê Îspanya bû endamê tifaqê. Lê divê bê gotin ku wate û girîngiya NATOyê piştî hilweşîna Yekitiya Sovyetê bi awayeke zelaltir û berbiçavtir derket holê.

NATO piştî hilweşîna Sovyeta Sosyalîst dêhn û bala xwe dabû ser welatên Yekitiya Sovyetê û welatên Pakta Warşovayê ku berê hemû jî hevkar û mûtefîkên wê bûn. Sala 1991ê Sovyet hilweşîya, di wan salan de Rûsya di nava bûxran û nezelaliyeke aborî û siyasî de bû. Nikaribû serê xwe rakira! Hema di wan deman de ji bo berfirehiya NATOyê ber bi rojhilat ve, tevgereke xurt destpê kir. Sala 1999ê sê welatên Pakta Warşovayê; Polonya, Çekya û Macarîstan tevli NATOyê bûn.

Lê tevî vê yekê jî Ewropa û Amerîkayê gelek caran diyar kir ku hevkarîya bi Rûsyayê re girîng e. Loma jî sala 1994ê Rûsya tevli 'Bernameya Hevkarîya ji bo Aştiyê' bû. Sala 1997ê di navbera Rûsya û NATOyê de 'Peymana Avakar a Têkiliyên Dualî, Hevkarî û Ewlekariyê' hate îmzekirin. Bi vê peymanê armanc ew bû ku rikeberiya berê ya heyî bê terikandin û têkilî û hevkarîyeke nû bi Rûsyayê re bê kirin. Bingeha Konseya NATO û Rûsyayê hate avêtin ku ev konsey sala 2002yê bi awayeke fermî hate damezirandin. Sala 2010ê di 'Konsepta Stratejiyê' de NATOyê diyar kir ku tifaqa wan ji bo Rûsyayê nabe tehdît û hate ragihandin ku di navbera herdu hêzan de armanca wan hevkarîyeke stratejîk e.

Lê NATO ji bo berfirehbûnê nedisekinî û eşkere bû ku tevlibûna sê welatên Pakta Warşovayê têra wê nedikir! Sala 2004ê, îmzeyê xwe li bin berfirehiyeke mezin da û heft welat xistin bin baskên xwe. Li gorî vê peymanê; Bûlgarîstan û Romanya, Slovenyaya ku ji Yûgoslavyayê veqetiyabû, Slovakyaya ku ji Çekoslovakayê veqetiyabû û Estonya, Letonya û Lîtvanyaya hersê welatên Baltîkê tevli NATOê bûn. Helbet vê yekê kir ku Rûsya bikeve nava acizî û nerehetiyeke mezin. Sala 2009ê Arnavutluk (Albania) û Xirwatîstan (Kroatia), sala 2017ê Qeredax (Montenegro) bûn endamên NATOyê û cara dawî jî sala 2020î Makedonyaya Bakur wekî endama 30yemîn a vê tifaqê hate pejiirandin.

Serhildan û Şoreşên Ûkrayna û Gurcîstanê

Li hêla din Gurcîstan û Ûkraynayê ji ber ku Rûsya ji xwe re sedema tehdîd û gefxwarinê didît, dixwest bikevin bin bask û parastina NATOyê. Helbet li gorî Rûsyayê û Pûtînê Serokê wê ev yek bi tûndî hat pêşwazîkirin. Di vê navberê de, sala 2004ê ‘Şoreşa Porteqalî’ (Orange Revolution) bi pêşengiya muxalefeta alîgirên Ewropa û Amerîkayê pêk hat. Sala 2014ê piştî protestoyên kolan û meydanan, Viktor Yanukoviçê Serokdewletê Ûkraynayê ji kar hat dûrxistin. Yanukoviç alîgirê Rûsyayê bû û ev yek bû sedem ku Rûsya bandora xwe ya li Ûkraynayê bi tevahî winda bike. Sala 2003yê jî li Gurcîstanê ‘Şoreşa Gulan’ (Rose Revolution) pêk hatibû, di encama vê serhildan û şoreşê de li Tiflîsa paytext rêveberî guherîbû. Eduard Şevardnazdeyê alîgirê Rûsyayê –ku di dema Yekîtiya Sovyetê de Wezîrê Karê Derve bû- ji serokatiya dewletê hatibû dûrxistin û Mihael Şaakaşviliyê alîgirê Ewropa û Amerîkayê bibû Serokdewletê nû yê Gurcîstanê. Divê Rûsya rê li ber vê yekê bigirta!

Destpêka sala 2007ê, Serokdewletê Rûsyayê Vladimir Putin beşdarî “43. Konferansa Ewlekariyê ya Mûnîhê bû. Putin di konferansê de bi zimanekî

tûj Dewletên Yekbûyî Yê Amerîkayê û NATOyê rexne kiribû û wiha gotibû: “Dewletên Yekbûyî Yê Amerîkayê (DYA) di gelek qadan de hedê xwe derbas dike û çalakî û tevgerên wî yê yekalî dibe sedema trajediyên.” Gotinên Putin careke din rasterast pirs û nîqaşa “gelo Şerekî Sar ê nû destpê dike?” anîbû rojevê.

Putin di heman axavtina xwe de ku çapemeniya Ewropa û dinyayê ciheke berfireh dabûyê- diyar dikir tevî ku Rûsya hêzên xwe ji Gurcîstanê vekişandine, li Romanya û Bûlgarîstanê moşek ango fûzeyên Amerîkayê hatine bicihkirin, ji ber vê yekê jî berfirehiya NATOyê, bi tu awayî alîkariya parastina aştîyê nake.

Serxwebûna Kırım û Donbasê

Piştî Şoreşa Ûkraynayê ya ku sala 2014ê pêk hat, Rûsya Kırımê dagir kir ku bajarê wê yê federal Sîvastopol e. Komara Xweser a Kırımê, di Adara 2014ê de referandûmekê pêk anî. Ji %89 beşdarî pêk hat û bi rêjeya ji % 97 bi awayeke fermî Kırım bû axa Rûsyayê. Divê bibêjim ku sala 1953ê Nikita Krûşçev Kirima Tataran wekî xelat da Ûkraynaya Sovyeta Sosyalîst. Wî ev yek ne ji ber hezkirin ango neteweperweriya Ûkraynî kir, lê ji ber ku her tiştên Kırımê jixwe ji Ûkraynayê dihat.



Li hêla din Herêma Donbasê ku ji Lugansk û Donestkê pêk tê, ji Nîsana 2014ê ve li rojhilatê Ûkraynayê wekî du herêmên xweser ên orijîna wê rûs e dihate birêvebirin. Meha borî ango Sibata 2022yê, Putinê Serokdewletê Rûsyayê biryarnameyekê îmze kir ku jixwe piştî vê yekê dagirkirin û Şerê Rûsya û Ûkraynayê destpê kir. Li gorî vê biryarnameyê, Putin 'serxwebûna' herdu herêman nas kir û li gorî gotina wî 'hêza aştîyê' şand herême.

Li gorî kakilê vê nivîsê dikarim bibêjim ku di vî şerî de armanca sereke ya Putin berfirehiya NATOyê ye. Bi gotineke din ji bo ku bi tu awayî Ûkrayna nebe endama NATOyê, wî ev şer da destpêkirin.

Gava Putin biryarnameya serxwebûna Donbasê (Lugansk û Donetsk) îmze kir. Herkes li bendê bû ku wê leşker bişîne Donbasê. Lê tevî ku Amerîka gelek caran bi daxuyaniyan jî eşkere kiribû ku xebatkarên sefaretê û hemwelatîyên wan divê yekser Kîevê û seranserê Ûkraynayê biterikînin jî, êrîş û dagirkirina seranserê Ûkraynayê ji bo dinyayê bû sûrprîzeke mezin.

Putin dixwest Zelenskî bibe Lukaşenko!

Li hêla din armanceke din a Rûsyayê jî ew bû ku rêveberiya Volodomir Zelenski bê rûxandî û rêveberiyeyeke di bin siya Rûsyayê de bê avakirin. Bi gotineke din daxwaza Putin ew bû ku kesekî wekî Serokdewletê Belarûsê Aleksandr Lukaşenko bibe Serokê Ûkraynayê.

Ji ber ku di van 15 salên dawî de tiştekî wiha pêk nehat, Putin pêl bişkoka şer kir. Wisa diyar e ku heta Putin hêza Zelenski neşikîne, qeweta leşkerî ya Ûkraynayê têk nebe, welêt ji mirovan vala neke û Behra Reş bi keştiyên xwe tije neke, nasekine.

Gava ev nivîs dihate amadekirin, di navbera herdu hêzan de, li Belarûsê du civîn pêk hatibûn. Lê encameke erênî û berbiçav hê jî derneketibû holê. Çav li rê ye ku heftaya pêş civîneke din dîsa li Belarûsê pêk were.

Lê mixabin di vê navberê de mirov têne kuştin, bajar têne rûxandî, miletek ji warê xwe koçber dibe û tîrsa mezin ew e ku ev şer û malwêranî berbelav bibe. Ji niha ve bi dehan dever û bajar hatine rûxandî û hê jî artêşa Rûsan êrîşeke mezin nedaye destpêkirin. Karwaneke mezin a Rûsan ber bi Kîevê ve tê û îro sibe tîrsa mezin ew e ku bi ketina bajarê re şer û peçûneke mezin destpê bike, pê re jî şerê kûçe û kolanan!

Bi hêviya ku avek li vî agirî bê kirin û rojek beriya rojekê ev şerê ku dibe sedema kuştina mirovahiyê bidawî bibe. Lê mixabin dibe ku piştî vî şerî welatekî bi navê Ûkraynayê nemîne...



**HEVPEYVÎN
BI HUNERMEND
SEYWAN
SAEDIAN RE**


Hevpeyvîn: Erol Başak

Sêva Mêxekrêj: Kevneşop û çanda Kurdî ya bi sed salan, remza evîn, aşîfî û lihevhatinê.

Ev çanda qedîm li ber mirinê bû. Lê hunermend, wênesaz û peykervan Seywan Saedian ev çand ji mirinê rizgar kir. Seywan Saedian zêdetirê bîst salan e projeya Sêva Mêxekrêj bi rê ve dibe. Ji bo ku ev kultur winda nebe û nifşên nû pê bihesin, bajar bi bajar li deverên Kurdistanê xebitiye. Projeya ku wî daye destpêkirin îro li derveyê Kurdistanê li Ewropayê jî belav dibe. Sêva Mêxekrêj êdî bûye semboleke Kurdî ya Valentînê. Bi taybetî di roja hezkiriyan ango roja Valentînê de çalakiyên Sêva Mêxekrêj li bajarên Ewropayê jî tên lidarxistin. Hunermend Seywan Saedian çawa hay ji Sêva Mêxekrêj bû? Projeya wî çawa dimeşe? Çi hedefên wî hebûn û çi qas ji wan kariye bidest bixe? Ligel mamoste Saedian me suhbeteke xweş kir. Kerem kin.

Çandeke Kurdan ya windayî bi saya te derketiye holê. Sêva Mêxekrêj. Baş e, çi ye sêva mêxekrêj? Çi wateya wê heye?

Kultûra sêva mêxekrêj kultûreke kevin ya Kurdan e. Di demên pêş de hebûye. Lê ji kengî ve hebûye bi rastî jî ne xuya ye. Yanî dîroka wê dibe gelekî dûr be û dikare ne pirr dûr jî be. Ji ber ku em dizanin wekî Kurd, dîroka me ya nivîskî û arşîva me ya Kurdî gelekî qels e. Yanî tişteki tespît kirî mixabin tune ye. Lê ev çend sedsalên dawî hebûye, di vê de guman tune ye. Mînak bêjim, min di sala 1999an de cara yekem ji diya xwe ew sêv girt û diya min niha emrê wê jorî 90 salî ye û bextewer dijî. Diya min dibêje ew ji dapîra xwe elimiye. Yanî niha diya min 90 salî ye û dapîra wê jî em bêjin eger di wan deman de 70-80 salî jî be ew jî ji kesekî din hîn bûye û çêkiriye. Herî kin 200 salî ligel min heye, yanî ev dîrok tespît bûye. Herî kêma evê ku li gor malbata me tê



xuyakirin. Xeynî wê ya jî li sala 1938an straneke Mihemedê Mamlê heye û dibêje; “Kake wa nab ê birakem wa nabê. Sêw be bê mêxek bo diyarî nabê.” Yanî sêw bê mêxek nikarî ji bo diyarî bişînî. Yanî gere sêw bi mêxek be. Ew di sala 1938an de tê gotin, ew jî helbesteke folklorîk e. Gelek çîrokên din jî henin. Ew sêw wekî kevneşopiyeye Kurdan hebûye û mixabin hatibû jibîr kirin. Gava ez zarok bûm me wek her kesekî wê stranê bihîstibû, lê min tu caran nedizanîbû ku çî peywendiyekê, çî eleqeyekê di navbera sêw û mêxek de heye. Sala 1999 bû û ez ji diya xwe xeyîdî bûm, ji ber ku di malê de pîrr hasas û pîrr dilnazik bûm. Hema tiştêk ji min re gotibana rojek-du rojan ez dixeyîdîm. Piştî min dît, diya min ji bo aşîtiyê ku me li hev bîne ew sêw çêkiribû, xistibû nav çanteyê. Min cara yekem ew wekî remzekê, wekî semboleke aşîtiyê girt. Û piştî min ji diya xwe pîrs kir, ji derdorê pîrs kir, ji malbata bapîrê min ku ew li gundekî ne ez çûm wan deran jî min pîrs kir. Min fahm kir ku ew zêdetir ji bo evîndariyê hatiye bi kar anîn. Bi taybetî jî gava keçikekê ji kurekî hez kiriye û nekarîbûye bêje, ji bo ku evîndariya xwe jê re eşkere bike, sêvekê jê re rêkiriye. Kengî sêvek bigehe destê kurekî dizane ku keçikek jê hez dike lê nikare bêje. Bi vê awayî min sêw dît û nas kir. Min hinekî lêkolîn kir. Ev sêw ji aliye estetîk jî gelekî tiştêkî xweşik e. Taybetmendiyeye wê gelekî taybet û yekane heye. Pîrr ecêb e ku ew sêw ji sed salan zêdetir wekî



xwe dimîne. Ev tişt bûn sedem ku ez li ser vê çandê, kultûrê bixebitim.

Tenê keçikan ew sêw daye kuran an kuran jî sêwa mêxekrê ji keçikan re dişandin?

Ji berê de wisa bûye. Berê ne wekî îro bûye. Niha pîrr rehet keçikekê dikare ji kurekî re bêje “Ji te hez dikim.” Lê di berê de û gava em zarok bûn tiştên wisa tune bûn. Yanî eger keçikekê tiştêkî wiha kiriba ew pîrr tiştêkî ecêb dibû. Wek gunehêkî lê dinhêrîn, wisa dihate hesibîn. Gerek e, em li gor demê tiştan binirxînin. Eger tu li gor niha bihesibînî maneyeke xwe tune. Êdî sînor rabûye. Niha li valentinê de her du jî dikarin ji hev re bişînin.

Sêw û bêhna sêwan mixabin êş û azareke mezin tîne bîra me Kurdan. Ji ber komkujîya li Helepçeyê. Lê berevajî vê sêwa bi mêxekan xemilandî hêvî û kêfxweşî dide mirov. Ev çand ji kengî ve hebûye? Di dîrokê de çawa derbas dibe? Çima sêw û mêxek?

Ev pîrs çend alî ye. Lazim e yek bi yek bersiv bidim.

Yek ku te qala Helepçeyê kir; rast e, mixabin bi bêhna sêwan li wê derê pênc hezar mirov hatin xeniqandin. Bi kîmyebarana dîktator Seddam. Li wê derê jî zehf komkujî çêbûn. Bêhna sêw jî hatiye bi kar anîn. Ji bo me jî pîrr tiştêkî nexweş bû. Le ez dixwazim tiştêkî bêjim. Min projeyeke pîrr mezin amade kiribû



gava ez li Başûrê dijiyam. Min plan çêkiribû ku em li Helepçeyê pênc hezar sêv mîxekrêj bikin. Min çend proje bi nivîskî jî, bi Kurdî û Îngîlîzî jî ji çend cihan re şand û bi welatê Japonî û şaredariya Hîroşîmayê jî em ketin tîkiliyê. Em wan pênc hezar sêvan bişînin Hîroşîmayê. Û li Hîroşîmayê jî erdekî bide me ji bo monomentekê ku wekî semboleke komkujîya Kurdan li wê derê me çêkirba. Ew pênc hezar sêv jî wekî navê pênc hezar şehîdan heba. Yanî navê her sevekê nîşaneyî şehîdekê be. Ew proje bi nivîskî hê jî li ba min amade ye. Lê mixabin li ba Hukumeta Herêma Kurdistanê çand û huner ji piştî her tiştêkî ye. Her tiştî difikirin ji xeynî çand û huner. Mixabin tenê petrol û tenê, gendelî (fesadî) cem wan heye. Mixabin qet guh nedane wê projeyê. Min ji parlementer-an re şand û serokê hikumetê re şand. Min ji dehan cihan re şand lê heya niha tu carî min hîç bersiv jî negirt.

Projeke min ya din hebû. Di şerê navberê PKK û dewleta Tirkiyeyê de nêzî 40 hezar kes hatin kuştin. Sîvîl û gerîlla û esker. Min dîsa planeke ji bo vê mijarê û bi sêva mîxekrêj amade kiribû, wekî sembola aşîtiyê. Ji her 40 hezar malbatê re sêva mîxekrêj bişînin. Weke remza Kurdan em bişînin. Proje pîrr mezin in û ji aliyê şexsekî nikare çêbibe. Mixabin heya niha min tu caran, tu cihekî nedît ku bi çandê re mijûl bin. Bi rastî jî ew siyasîyên Kurd û partiyên siyasî yên Kurdan mixabin pîrr dûrî çand û hunerê ne û herî derbeyên mezin jî ji vê derê xwarinê.

Sêv di dîrokê da, gelekî meyweyekî balkêş bûye. Û her tim roleke taybet ya sêvê hebûye. Gava em mîtolojiyê guhdarî dîkin, dibînin ku mîweyekê pir kevnar e. Xuya ye ji demeke pîrr zû dê hebûye. Ji ber wê dibêjin Adem û Hewa dema li bihiştê bûne gava ku sêv dixwin ji bihiştê tîn avêtin.

Di dinyayê de sêv sêv pîrr bi nav û deng in. Yek; sêva ku Adem û Hewa jê xwarine. Ya duyemîn sêva Newton e. Gava ku li bin darekê ye û sêv li serê wî dikeve. Û piştê Newton ew yasayê rakişandinê, kişandina erdê keşif dike. Ya sisê jî Apple e, an jî sêva Steve Jobs e.

Planeke min ji bo çêkirina filmêkê heye. Dixwazim belgefîlmekê çekim bi navê “Sêva Çaran.”

Girîngiyêke taybet ya mîxekê jî heye gelo? Çîmkî bi rastî sêv û mîxek baş li hev hatine.

Bêlê, bê guman. Mîxek wek ku hûn jî dizanin ew maddeya bêhişkirinê ye. Di diransaziyê de jî maddeyên wisa dibe sedem ku ew êş neyê hîskirin, ji mîxekê tê çêkirin. Û ji berê jî gelek caran gava êşa diranan çêbûye, mîxekê xistine nav diranan û êşê kêmkirîye. Sêv bixwe maddeyekî fîbîr e. Fîbîr di nav de pîrr heye. Gava ew (sêv û mîxek) digihîjine hevdu, hevdu digirin, pîrr hişk dibin bi hevdu re dimînin. Ev hişkkirin berê jî di nav me de hebûye. Di nav mîletê din de jî hebûye. Mînak bêjim; qeysî/mişmiş, tu bidane cihekî, tu dikarî du-sê rojan bihêlî. Herî zêde sê-çar rojan dikare bimîne û birize. Lê balkêş e, gava qeysî vedikin, didin ber tavê, hişk dibe wekî qeysiya hişk du-sê salan jî dimîne. Ew hişkbûn emrê tiştan zêde dike. Ev hêla zanistê ye. Vêca ez hunermend im, ew ne karê min e. Ez ji hêla hunerê ve li vê meselê dinêrim. Lê ez ji ali-

yê zanyarî zêde nizanîm, jixwe ne karê min e jî. Ez hêvî dikim, di demên pêş de lêkolînên zanistî jî bînin kirin, ka ew sêv çawa sed salan dikare wisa bimîne.

Min par li malê ji xwe re sêva mîxekrêj çêkiribû. Hê saxlem e. Dibêjin sêva mîxekrêj xira nabe û dikare 100 sal bimîne. Bi rastî jî wisa ye? Û çawa dikare wisa bimîne?

Wekî min got bi rastî ez ji alî zanistî de tiştan nizanîm. Kesên bi zanistî ku li ser wê meselê dixebitin dikarin bêtî çima dimîne. Lê sêvên mayî rast in. Ji ber ku niha li Mehabadê sêvên me yê sed salî hene. Ya herî nêz jî sêveke min ku min bîst sal berê çêkiriye digel min heye. Yanî ez dibêjim herî kêr sed sal dimîne, belkî 200 sal jî bimîne. Bi rastî jî dimîne. Lê ew çawa dimîne? Çima dimîne? Bi rastî ez nizanîm. Min ev neafrandiyê, lê min ji mirinê rizgar kir û bi projeyên hunerî ya cuda karibûm bi netewî û navnetewî bikim.

Di folklorê Kurdî de çîrok jî hene. Bav û keçikê li gundekî bi hev du re jiyane û erdê wan jî zêde bûye. Dema genim û giyayên xwe didûrin, hêz ya wan wan kêr e. Berê gel alikariya hevdu dikirin. Di soranî de dibêjin herewez. Yanî çend kes tînan alîkariya wan dikin. Rojê çar kurên xort ku ji vî keçikê hez dikin dixwazin alîkariya wan bikin. Û ew keçik ji rojê berî de diçe çar sêvan dide wan. Her yek bi dizî. Û roja ku ew tînan genim didûrin, stranên dibêjin, ji aliyekî din ve jî dibêjin “Gelo ew keçik



ji kê hez dike?” Keçik bersiv dide û dibêje; “Ew kurê ku sêv di bêrika wî de ye, ew bi xwe fêhm dike.” Û daye her çaran jî. Ji bo ku baş bixebitin. Tiştêkî balkêş e, em dizanin di erdnîgariya Kurdistanê de dema genim tînan dîrin sêv çênabe. Xuya ye keçik ew sêv berê çêkirine. Çima di dema genim tînan dîrin de sêv hebûye ligel wan? Lewma di sirûştê de sêv tune ye. 100 sal berê teknoloji jî tunebû ku di her çar demsalan de jî sêv hebe. Xuya ye ku keçik sêv mîxekrêj kiriye, sêv kariye bimîne. Lêkolêrên ku van kara dizanin divê li ser vî lêkolînan bikin. Tiştêkî din jî bêtî; berê parfûm û bêhn û tiştên wisa tunebûye. Eger hebe jî di destê her kesî de nebûye. Di destê dewlemendan de, di destên hin kesan de bûye. Bêhna sêva mîxekrêj pirr xweş e. Her tim bêhna wê heye. Ji ber wê em dibînin her tim di nav kincan de ye. Di nava boxçikan de bû ye. Min xwe dîtin. Berê komîdî û dolab û walîz û tiştên wisa tunebûn. Di nav sindoqan

de, qûmaşan de bûye. Her tim sêveke mîxekrêj di nava kincan de heştine ku bêhna wan xweş be. Vêca wan ev tecrûbe kirine, ev tecrûbeyê gelê me ye.

Mamoste te qet lêkolînan kirine gelo? Yanî ev çand bes li aliyê Rojhilat hebûye an li çar perçeyên din jî mînak henin?

Belê, hebûye. Wek mînak bêtî; ligel min vîdyo heye. Vîdyoya Şêx Mihemedê Şakelî. Berê wezîrê rewşenbîrî bûye li Silêmanî. Şêx Mihemed bi xwe di vîdyoyê de dibêje ku li herêma Germiyanê jî ev çand hebûye. Gava ew zarok bûye li gundê wan kesek hebûye. Dizanî hinek hene li gundan xwe pirr xweşik dikin, simbelê xwe reş dikin. Û dibêje li gundê wan jî kesek hebûye û di nav gund de digera, her tim di destê wî de sêva mîxekrêj hebûye. Şêx Mihemed bixwe dîtîye. Ji xeynî wê mînak bêtî; heman li Germiyanê lêkolînerêkî heye bi nava Herdewêl Kakeyî. Ew jî lêkolînan tiştên folklorîk dike, dibêje ji xeynî sêvan, narinc ji

mêxekrêj kirine. Helbesteke bi zaravayê Maço dibêjin, nêzî Hewramî ye dibêje; "Xalê ha we ban zincî zincewa, alêy mêxek e be narincewa" Yanî ew helbestên folklorîk li Germiyanê jî heye. Wekî min bihîstiyê heta li bakurê jî li aliyê Meletiyê jî çêbûye. Hevaleke min li Stenbolê mîmar bû, ew dibêje, ew ligel dapîra xwe wê tiştî dîtiye. Lê hewce ye lêkolîn berfirehtir bibin. Lewra sêva mêxekrêj bi tenê beşek ji karên min e. Ez peykervan im, wênevan im û sînemakar im. Bi dehan projeyên min hene. Ez nikarim hemû enerjîya xwe bidimê û ew dibe ku kêmasiya min jî be. Tam lêkolîna her tiştî çênabe. Lê bi-rastî ez pê nagihêm.

Sêva mêxekrêj wek projeya te destpê kir. Û niha li gelek deverên cihanê di hefteya roja hezkiriyan de çalakiyên sêva mêxekrêj têne lidarxistin. Gava tu dibînî çi hîs dikî? Tu jê memnun î?

Min di sala 2010an de li başûrê Kurdistanê di roja Valentînê de li 44 bajar û bajarokan ev proje çêkir. Li Kifrî û Kelar û Xaneqîn heya Şengal û Başîqê jî em çûn. Yanî li hemû herêma Kurdistanê ev proje çêbû. Li vê derê me ji bo her bajarekê broşûrekê wekî pirtûkekê jî çap kiriye. Di beşekê de min daye xuyakirin ku sê pêvajoyên projeyê hene. Pêvajoya yekemîn; vejîn e. Yanî ew sêv ji mirinê rizgar bibe û bibe çandeke Kurdan û ji mirinê rizgar bibe. Bex-

tewar im, ew pîrr zû çêbû. Hema di 3-4 salan de. Ji ber ku li başûr jî gelek girîngî pê hat dayîn. Di 2007an de me li hotêl Çarçira ev proje rêvebir û gelek parlament-er û wezîr û gelek kesayetên hunerî û çandî beşdar bûn. Di 2008an de li çar bajarên Kerkûk, Dihok, Hewlêr û Silêmanî çêbû û pîrr deng veda. Her wisa mezin û mezintir bû.

Pêvajoya diduyan; bi netewîkirin e. Yanî em wê wekî çandeke Kurdan li her çar perçeyê Kurdistan nas bikin û çêbikin. Ku ev jî hêdî hêdî çêdibe. Niha li her çar perçeyên Kurdistanê hatiye naskirin, gel çêdike, gel jê hez dike. Û derveyê vêya jî di sala 2013an de min kompanî VÎNSEV vekir. Ew berhem me di asta pîrr bilind û xweşik qotî û çente me jê re çêkir. Logoya wê jî heye VÎNSEV. Bi Kurdî û Îngilîzî peyameke evîn û aştiyê jî li ser heye (a message for peace and love). Û me ser nivîsandibû: Proudly made in Kurdistan.

Ew proje di asteke mezin de çêbû. Di sala 2013an an jî 2014an de ev sêv ji ali-

yê Desteyî Geşt û Gûzarî ya Hikûmetî Herêm bi fermî wekî diyariya Kurdan hatiye naskirin. Min di 2012an de patenta wê ji Iraqê jî girtiye.

Qonaxa sisêyan jî bi nav netewîkirin e. Bi rastî jî projeyekê bi nav netewî bikî bi şexsekê pîrr zor e. Û mixabin ya me jî dewlet tune. Hikûmeta Herema Kurdistanê ku bi Îbrahîm Tatlisês û Ezîz Weysî û nizanim bi tiştên pîrr beredayî mijûl e, bi alî sivik de... Bi rastî pîrr dilîsikestî me ji Başûr. Hema hema dibîhîzim halê min xirab dibe. Dizanim çi derfetên mezin hebûn ku em bikaribin tiştên mezin bikin, qala tiştên xweşik bikin. Tiştên asta dinyayê de çêbikin. Lê wana heya niha jî mixabin bi petrol û bi dizî û tiştên beredayî din re mijûl in. Ew proje wisa, demekê pîrr serkeftî bû. Pîrr pêş ket, me pîrr baş pêş xistibû. Lê herî dawî wisa ma û proje bin ket û ez bi xwe gelek jê deyndar mam. Hinek kes pîrr rehet dixwazin xwe bikin xwediyê wê projeyê, mirov pîrr aciz dibe. Lê ev kedeke hunerî ye. Di sala 2013an de ji bo patenta wê li Iraqê çekim min gelek mesref




kir. Li welatên din jî pîrr pere diçe ji bo wan. Lê min tu car heya îro jî tu qezenc jê negirtiye. Armanca min jî ev nîne. Ji bo min ew projeyeke çandî ye, hunerî ye ne projeyekê ekonomîk e.

Pêvajoya sisêyan jî niha maye. Ew bi xwe karekî pîrr zor e ku wek şexsekê bi tenê bikim. Lê bextewer im ew proje heya niha li Belçîqayê, Almanyayê çêbûye. Li Swêdê sê sal in çêdibe û çar bajaran çêbûye heya niha. Li London, Tirkîyê, Başûr, Rojava, Rohilatê çêbûye. Yanî ew proje bi xwe hêdî hêdî bi rê diçe. Ez pîrr kêfxweş û bextewer im ku min ev projeyê ji mirinê rizgar kir, bi awayekî modern. Ji ber ku ev jî pîrr girîng e. Dema ku ew pakêta diyariyê dibînin ew ne tiştêkî normal e, gelekî berhemeke modern e. Li başûr herî zêde mişteriyên Vînsêvê gelên Ewropî, Emerîkî bûn. Ji ber ku wek remza Kurdistanê tiştêkî tunebû ku

ligel xwe bibin. Ji ber ku mirov diçe welatekî, dixwaze tiştêkî wek sembol ligel xwe bibe.

Dixwazim vê jî bibêjim, alîkarî ji hinek cihan û kesan jî çêbû. Wezaretê Şehîdan hezar sêv kirîn û şandin Holandayê. Ji bo dema peykerê Omerê Xawer çêbû. Ji boy ev saziyên ku li hemberî sîlehên Kîmyewî dixebitin şandin wê derê, wekî remza Helepçeyê. Parêzgeha Hewlêr jî hezar heb ji wan standin. Bi vî awayî gelek tişt jî çêbûn lê di dawiyê de nebû projeki mayende. Mînak bêjim, min du caran ligel parlêmanan rûniştim. Min bi nivîskî ev proje daye wan ku li parlamentoyê rojekê ji bo evîn û aşitiyê bê diyarkirin û sêva mêxekrêj jî wekî remza evîn û aşitiyê bê diyarkirin. Lê mixabin xema wan ne welat û ne tiştên netewî bû û ew proje wisa ma. Lê pêvajoya sisêyan pîrr zor e, lê ez dimeşînim. Dixwazim vê jî bibêjim. Tev



sêvên ku li wir dihatine çêkirin ji aliyê penaberên rojavayê dihatine çêkirin û me pere dida wan.

Tişka ku tu bixwazî lê zêde bikî heye gelo?

Ez rica dikim ji gelê me, hurmet bidin keda hunerî. Ez xwedî proje me. Ez dixwazim mala her Kurdekê de sêveka mêxekrêj hebe. Îsal Chalak Eventsê li ser affîşê ku me bi xwe çêkiriye, eynî affîşê ku çar sal berê me bi hev re çêkiriye, eynî projeyê bêyî ku tiştêkî jî zêde bikin wekî projeya xwe didin nasîn û didizin. Bi rastî ev derveyî exlaqê Kurda ye, der exlaqê mirovahiyê ye. Cihekî din jî heye. Fîrûze Kahve hebû li Amedê. Du salan me bi hev re çêkir, sala sêyan eynî affîşê ku min bi kar anîye tenê navê min rakirine. Û ser navê xwe belav dikin. Hêvî dikim her Kurdekê li mala xwe de sêveka mêxekrêj hebe. Lê gava ku wekî proje bi kar tînin, bila bizanin xwediyekî wê heye, kesekê ku ser wê zehmet kêşayî heye. 20 sal in ez dixebitim. Bila em kedê hevdu nexwin û bila me jî neêşînin. Ji şûna ku enerjîya min ji bo navnetewîkirinê biçe, ez biçim ser şexsekî yan jî grûpekê doz vekim û qeyb bikim. Ji xwe ez li ser vî tiştî dixebitim. Bi hezaran berhemên folklorîk yê Kurdan henin; heke hûn bi rastî jî ji çanda Kurdan hez dikin, keremkin li ser tiştêkî din bixebitin. Ez jî dixwazim hûn van tiştan belav bikin. Hurmet heye, exlaq heye û yasa heye. Ez pîrê eşiyam. Daxwaza min heye, demên pêşde kî dixwaze bi kar bîne ser seran û ser çavan. Ez dikarim ji bo her kesî alîkar bim. Û tu daxwaziyên min jî tunin. Lê gava ku projeyê ser navê xwe bi kar bînin bi rastî jî ew tiştêkî derveyî exlaqê ye.

Gelek spas û saetxweş hunermend Seywan Saedian, ji bo vê hevpeyvîna xweş.



VALENTINA KURDÎ: SÊVA MÊXEKRÊJ

RIDWAN XELÎL



Li Londonê roja hezkiriyan bi awayê Kurdî hate pîrozkirin. Bi navê "Valentina Kurdî" di 13ê Sibatê de çalakiya Sêva Mêxekrêj hate lidarxistin. Sê heval û sê dildarên çanda Kurdî ji bo ku vê çanda delal bi Londoniyan bidin nasîn organîzasyonêk saz kirin. Kurdên li Londonê digel malbat zarok û cînar û hevalên xwe beşarî çalakiyê bûn. Dora 40 kesî bi hev re sêvan bi mêxekan xemilandin. Bi hevkarîya xwediyê projeya Sêva Mêxekrêj hunermend Seywan Saedian, li Londonê cara yekem çalakiya Sêva Mêxekrêj hate kirin. Yek ji organîzatorên çalakiyê Îzzet Bozkurt wiha qala çalakî û mebesta wan û xwe kir.

Îzzet Bozkurt-Organîzatorê Çalakiyê

Sêva Mêxekrêj çi ye? Yekemîn divê ez ji vir destpê bikim. Sêva Mêxekrêj bêhtir di nav Kurdên Rojhilat de, ji berê de, ji sedsalî zêdetir ve tê çêkirin. Nîşaneyê evî, lihevhatin û aşitiyê ye di navbera hezkiriyan de. Heke tu ji yekî hez bikî, sêva mêxekrêj jê re dişînî. An jî heke tu şer bikî bi hezkiriya xwe re an hûn dilê hev bihêlin, tu dikarî bi sêvekê vê meselê çareser bikî û xwe bidî efûkirin. Ev çand bi sed salan e di nav Kurdên Îranê de heye.

Hunermend Seywan Saedian di sala 1999an de ev çand da nasîn. Ku ew jî vê çandê ji diya xwe hîn bûye. Wî xwest ku ev çand bila nemire û di nav Kurdan de geştir bibe û belavtir bibe. Ji wê rojê pê de, tevî gelek tengasiyan, hêdfî hêdfî ev çand li her çar parçeyên Kurdistanê belav bû û hêj jî dewam dike.

Ev 2-3 sal in ez hatime Londonê, beriya ez werim Londonê li Diyarbekirê ez tevî vê çalakiyê bûm. Li vê derê min Seywan Saedian û hunera wî nas kir. Ev çalakiya Sêva Mêxekrêj jî min li vir nas kir. Tiştêk balkêş ji min re hat. Min got çima çandê wilo xweşik, jêhatî di nav Kurdan de nedomînin? Û li Londonê, tu jî dizanî Kurdên me gelek in li vir. Me xwest li vir di nav Kurdan de em vê çalakiyê lidar bixin, destpê bikin û her sal bidomînin. Hem ji bo domandina çanda me û hem jî ji bo gelê me wê tiştêkî baştir û çêtir be.

Îro me li Londonê destpê kir û bi rastî jî baş bû. Cara yekem bû loma hepî kêmasiyên me jî hebûn. Lê li hemberî kemasiyan em neketin tengasiyê, beşdariya çalakiyê jî baş bû. Bi rastî ev hevîyekê jî dide me ji bo pêşerojê û salên li pêşiya me, ku em çalakiya xwe xurttir, xweştir, çêtir, geştir û dewlemendtir bikin.



Pirraniya kesên ku hatibûn çalakiyê yekem car li vir sêva mêxekrêj dîtin û çêkirin.

Belinda Perriman: Min cara ewil çend sal beriya niha di Twitterê de dît. Min gelek eciband. Û ez çûme malê û min jî hebek bixwe bi sêv û mêxekan çêkir. Û ev cara yekem e ku tîm çalakiyêke wiha ku bi dehan mirov li vir kom bûne û di atmosfereke pîrozbahiyê û romantîk de bi hev re kevneşopîya Kurdî, sêva mêxekrêj çêdikin. Ev kevneşopî ji şiroveya rojavayî berfirehtir e. Bi min di warê parastina evîne de, ev konseptêke pirr delal e. Çimkî tu sêvê bi mêxekan dixemilîn û dipêçî û her wisa ew demeke pirr dirêj dimîne. Ji bo me zehmet e ku meriv tehmîn bike; ka evîna me heta kengî berdewam bike. Lê sêva mêxekrêj bi sed salan dimîne. Ev gelekî simbolîk e û kevneşopiyêke pirr delal e.

Sulaiman Othman: Mixabin ev cara ewil e ez dibihîzim. Em Kurdên Rojava, me nebihîstibû, ez bi şexsê xwe nebihîstibûm. Bi hatina me ya vê derê wek xelkê me yê her çar parçeyên Kurdistanê tiştêkî gelekî baş e. Û min gelekî hez ji maneya sêva mêxekrêj kir. Tiştêkî mirovahiyê û yê hezkirinê ye. Peyama ku digihîne gelekî xweş e. Û em dixwazin zarokên me yên Kurdan jî vê çîrokê bielim.

Dilek Altun: Ez bi hevala xwe re hatim vê çalakiyê. Lê ev cara yekem e ku ez lihevanîna sêv û mêxekan dibînim. Karekî bi kêf e, sebrê dixwaze. Min cara ewil sêva mêxekrêj çêkir. Bi rastî şa bûm, kêfa min jê re hat. Wateya wê jî hîn bûm. Tu bi hezkirinê çêdikî û didî hezkiriya/ê xwe. Ji bo vê ked divê. Lû xwe bû ked jî tiştêk nabe.

Cemal Bayir: Bi min ev hesteke pirr xweş e. Ev cara ewil e ez dibihîzim û çêdikim. Bi rastî tiştêkî pirr baş e. Ez maneya wê jî hîn bûm. Maneya wê evîna û aşitî ye. Em niha mêxekan bi sêvê ve dikin. Ger me ev sêv rind tijî kir dibêjin; sed sal wê bimîne xira nebe. Dema te ji yekê hez kir, çi xanima te be, çi keça te be, tu vê sêvê didiyê. Ev sêv sed sal saxlem dimîne û namirê. Bi seba van qerênflên û tu hezkirina xwe bi vê nîşanê didî. Yanî min ev wilo fêhm kir. Ez gelekî kêfxweş bûm, bi hînbûn û çêkirina sêva mêxekrêj. Û ez ji dil spasiya organîzatorên vê çalakiyê dikim.



NEWROZ Û SERSALA DIL NECAT ZIVINGÎ



Çîrok, bi newrozê dest pê dike. Di destana Mem û Zînê ya Ehmedê Xanî de. Sal 1694.

Pêncî sal berya Xanî (1642), Ewliya Çelebî li mîrektîya Amêdîyê dibe mêvan û dibîne ku di newrozê de Kurd derdikevin seyrangehan, ligel xwendina kilam û helbestan şahîyê dikin.

Îcar 600 sal berya wan, şairê Kurd Baba Tahirê Uryan, wesleta yara xwe dişiband dilxweşîya newrozê û digot: "Wisalet ger me ra gerded muyeser / Hemê rozem şewed Newroz"

Lewma Xanîyê nemir, newroza siltanî kir sernavê beşa 11an ya Mem û Zînê û ev demsala surûr û şadimanîyê wek "Mersûmê qedîmê Kurdistanî" bi nav kir. Çîrok, ji devê "Zanayê muemerê kuhensal" yanî zanayê pir jîyaye, pir dîtiye û derbas kiriye tê vegotin. Ew jî dibêje "Adetê pêşîyê zemanan / Ev bû li hemî cih û mekanan". Roj, şeşsiwarê rojhilat e. Dema gera xwe di meha Adarê de nû dike û tê bircê sersalê; "Qet kes nedima di mesken û mal"ê.

*Roja ku dibûye îdê Newroz
Te'zîmî ji bo dema dilefroz*

Bi vî awayî mîhrîcan û şahîya hezar salan dest pê dike. Bi taybet ciwan û keçên xama, xwe dixemilînin, sef bi sef dimeşin çîya û deştan, ref bi ref dixweşin seyr û geştan. Ew horî û perî, bê perde û bê westan û bê minet derdora xwe dikin bihûşt. Xortik û nûciwan bi dilpakî zilfên xwe bi ser memikên xwe yê nûgihayî de berdidin. Mîna qumaşan rûyê xwe yên delal, dîmenên xwe yên bedew û bejn û bala xwe pêşkêşî hev dikin.



*Sewdaserê îşqê bûn di bazar
Hem bai'ê husn û hem xerîdar*

Bi vî awayî wan xama û rewalan, ligel sedsalî û pîr û kalan, sersala xwe li gor kevneşopîya Kurdan pîroz dikirin û digerîyan. Lê di vê mîhrîcanê de hinek jinan xwe bi cilên mêran, hinek mêran jî xwe bi yên jinan dipoşan, efsûn û kelecana mîhrîcanê zêdetir dikirin.

*Wan lew kiribû lîbas tesrîf
Da qet nebitin li wan çi teklîf*

*Poşîde lîbasê dilberanî
Seyran dikirin bi sergiranî*

Dema di vê rewşê de li kolanên bajêr dimeşin li dîmenên ecêb rast tî. Li her alîyî şahî ye, her kuçe û kolan û şibak bi awirên mirovan şên e.

*Sermest hinek, hinek di serxweş
Dembeste hinek, hinek di demkeş*

*Goyende hinek, hinek di xamûş
Poyende hinek, hinek di medhûş*

Hinek serxweş, hinek bêhn çikiyayî, hinek sitranan dinuhurin, hinek diaxivin, hinek bêdeng in, hinek dimeşin, hinek sekan in... Lê ya ecêbtir hinek cilên xwe diqetînin, hinek hişê xwe diavêjin... Wê rojê "Hin bûyî ji qeydê aqil azad" û xwe bi destê dilê xwe ve berdane. Dîmenekî pir enteresan. Bar û bend e aqil, pîrî caran. Û vaye ew dema taybet hatîye, bi her awayî azadî ye. Ev çîroka Newrozê mîna çûyîna welatê xewnistanê ye, ku îro ji me pir dûr e. Çima gelo?

Berya vê binivîsim, 24ê Sibatê li Swîsreyê bajarê Luzernê, tevî mîhrîcana Fasnachtê bûm. Dîmenê Newrozê ku Xaniyê nemir di Mem û Zînê de digre, niha çêtir dikarim xeyal bikim. Li Swîsreyê yek ji festîvalên herî balkêş Fasnacht e. Li kolanan bi hezaran mirovên bi kostûmên fantastîk, mûzîk û dans û rêûresmên bandoyan... Ji heft salîyan heya heftê salîyan. Her yek bi maske, serpûş û kostûmekî cuda. Weke hemî lehengên mîtolojîyan, yên filman û navdarên îro li wê festîvalê civiyabin. Gel bi coş û kelecana diherike kolanan. Ne dewlet, ne partî, ne jî sazîyek vê mîhrîcanê bi rê ve dibe. Her tişt sirûştî ye. Her avahî, pir û kolan dîrokî... Her mirov rûken û dilşad. Mîna Newrozê ev mîhrîcan jî çend rojan didome. Ji serdema paganîzmê maye. Ji bo tirsandina rihên xirab ên zivistanê tê pîrozkirin. Çawa em Kurd dibêjin: "Sibat bireve, Adar hate te!"

"Me Kurdan 'îdekê qal e / Dilo şa be ku sersala e" Evdîrehîm Zapsû, di Newroza sala 1919an de li Uskudara Stenbolê wiha behsa Newrozê dikir û didomand:

*Siwar in cumle ser hespan
Ji bo rimbazî û meydan
Cîrdê bikin wekî şêran
Ku roja şadiya Kurdan*

Hê roj hiltê. Agir, gur û geş dibe. Piştî her şevê sibeh e. Piştî her zivistanê bihar. Kurd dîsa û dîsa jîn dibin. Çima em cilê xwe neguherin, bi kolan û deştan nekevin! Çima ew newrozên efsûnî li me venegerin!

*Ev narê sîqala dil e daîm li wê qala dil e
Newroz û sersala dil e weqtê hilêtin ew sîrac*

Erê, gula baxê îremê Botan! Ev agir e ya ku dilan dibiriqîne, tim li ser zimanê me ye. Roja ew çira pêket, newroz û sersala dil e.



GOVEND LONDON

Özgür Ataş Kurdê Semsûra Bakurê Kurdistanê ye. Wî mîsyoneke kulturî daye ber xwe û li Londonê digel çend hevalên xwe organîzasyoneke bi navê Govend London avakiriye. Dans û govendên Kurdî li ber Kurdan û kesên ji netewên cuda hîn dike. Workshop û xebatên wî her tim qerebalix in. Di dema workshopan de dengê stranên kurdî li eywanê olan dide, cihê workshopê bi govendên Kurdî dibe cihê dîlanê. Me bi Özgür Ataş re hevpeyvînek bi zaravayê Zazakî çêkir. Kerem kin ka Govend London çî xebatan dike ji hevpeyvîna me hîn bibin.

Özgür Ataş- Wertaxê Ronayîşi Govend London



Fıkrê Govend London çî wext u seni ame şîma vir? Qandê na xebat hedefê şîma çî bı?

Ez serre 2017'dî ameya Londîn. Werî Londîn kaye mî Stenbol'de bî. Mi Stenbol'de danse Kurdan (Govend), Avrupeyan (Bal-folk) û Ruman kerdene.

Londîn'de mi cayek nêdî kî ez tedi Govend kay bikerî. O wext ra mî zî Govend London kerd ra kî ma hem Govenda bîmus hem zî Govend key bikim.

Ziwanê Kurdî, danse Kurdî û muzîk â Kurdî zaf weşo. Ma wazanê kî Britanya û Dînya bizano û bimuso. Ma pîya klaman xo waj û Govendâ xê key bikir.

Ekiba Govend London senin a? Şîma çend tenê, fealiyeti şîma ça benî?

Embazima pêro xo zerr ra yenî. Ez senî waj, ma desi panc embaz. La her kermedarî de ê desi panc Embaz wîja de nêbenî. Her kermedarî de embazî newe yenî. Kermedarîye Sibata de 60 insanî ame.

Mâ kermedarîye xoye Amnanî Clissold Parkti kenî. Zimistanî de zî caye Atas London Hackney Wick de esto. Ma wijadi kenî.

Şîma çendêk wext dî fealiyet kenî?

Aşm de yew denim ma Londîn de kermedarîye ken. Aye ra ber, sukan û welatan binan de festivalî dans beno. Ma wîja de zî kermedarîye kenî.

Heta nîka alaqa senin o? Kam yeno şîmayâ dans keno? Workshopan dî kam çîta museno?

Vallay îlgî alekâ hem zafo hem zî rîndo. Her aşm de embaze

newe yenî. Embaze verin beno dilxwazi. Millet e Kurdî û Britanî û Avrupayî yeno. Mâ dersan de Govend musnenî. Badîne dersan de zî Govend kay kenî.

Merdîmi ki milletanê şerib-an ra yi, workshopan ra pey wext zenginiya kulturê Kurdan vineni se vani?

Govend râ zaf hes kenî. Keyfe îna bol wes beno çûmkî hem muzîk â Govendî zaf gonîyo hem zî Govend enerjetîk a. Ro e koman zî înan ra zaf rind yeno.

Gelo şîma qayili sê yi kursi daimi ders bîdî? Ya zi waştîşêko hînayin esto?

Bele, mâ zaf kayilî derse govend ra dest pekîr. La ma hewna kes ra nêvato. Payîz de her xefte çend gruban ra ma dersî bidî. Înan ma ra zaf pers kenî o samed ra ma zî wazene kî lez dest pey biker.

Yo şaro ki bı serran asim-ile biyo şîma dansê înan dani şînasnayîş. Şîma çî cefa vînenî?

Hem ê hem zî nê. Embazi ke Tirkî û Tûrkiye nîzani ina yînan ra çetîn nêyo çûmkî mâ ra Kurdan ra xebardar benî. Embazî Tirk yan zî Kurd û Tûrkiye'dî yanzî Bakûre Kurdistan'dî ameye Dînya wijadî biyî gîrd, şîye mekteb, kulturâ Tîrki girotî, înan ra zaf çetîn yeno.

Çûmkî televzîone Tîrkandî Kurd, însane normal nêyo, yâ hînto, yâ cahîlo, yâ zî dizdo. Senî vacî, însano erciayîn nêyo. Kandî ca de kultur zî, klâm zî, Govend zî kare hintano.



Çalekî mādî, mâ hêm zerre xô wes keni hem zî hemî insanân ra musnenî. Mâ hem normalî hem zî modernî. Zuwani ma zî, muzîk a ma zî, dans ê ma zî zaf qîymetlî yo . Ma zî zaf qîymetlî yo.

Şima wext bioni tera şima govenda kurdan u dansanê Rojawani seni vinenî?

Danse Avrupaî zafe, ez per-an nêzana la ez eşkena çen xab hîna mîsalan bidî. Danse Britanî esto, Brîtîtana, Franse de name yew cayo. Danse înan zî zey aye mayô. Milletî cî xalke ra beno madî, mâ doşan xo zî lernzenî, înadî doş çêniyo.

Britanya de danse Cellie, contra, Morris etc.. esto yî zî danse grupe la xalke nêyo.

Şima menga verin pê iştiraqê Suna Alan yo xebat kerd Londra di. Ma ra ver zi xebati esti? Tarixê inan belli yi?

Bele, kermedariye ma zaf xwes bî ez Suna Alan ra, Flotsam Session ra û Poplar Union ra zaf spas kena.

Programe Kermedariye ma cerde nustîyo:

- 26 Sibat Sheffield IVDF
The Inter-Varsity Folk Dance Festival.
- 19 Adar London
Dance around the World
- 20 Adar London
Newroz in Finsbury Park
- 23 Adar London
Workshop
- 15-17 Avrêl
Berlin Kurdish dance and Music Festival

Peyni dî ez inay persi, UK da êyi ki govend u worksho- panê şîma mereq keni şîma inan ra se vanî?

Ma xo ra zaf hes kenî, mâ danse xo ra zî zaf hes kenî. Mâ govend key biker se keyfa ma zaf ho cado. Ma benî şa. Mâ kayîlî keyfe şîma zî rindiv û wes bo. Beren ma pîya govendî kay bikir. Instagram de mâ takîb bîkenî, @govendlondon hesaba ma yê. Şîma eşkenî wîja ra xeberdar be.

Zaf spas Özgür Ataş.

The Hall Kurdî ra zî zaf spas kena. Mâ zaf keyf wes bî, sima de kîsey kerdiş a.



GOVEND LONDON

Özgür Ataş:

+447555184386

govendlondon@gmail.com

@govendlondon

Govend London



DALEEL HAGY

Damezrîner û Revebirê
Trees Against Povertyê



ALI OSMAN

Direktorê
Trees Against Povertyê

Bêdarhiştinê Bandoreke Çawa Li Ekosîstema Bakurê Rojhilata Sûriyê Kiriye?

Li Herêma Bakurê Sûriyê û Herêma Kurdistanê Iraqê berê daristanên savanna hebûn ku ji darên bi têra xwe fireh û cureyên cuda yê giyayên ku di wêne 1ê de hatine nîşandan pêk dihat.

Vê ekosîstemê ji bo mirov û hemû zindiyan jîngeheke xwezayî, saxlem pêşkêş dikir. Ekosîstema daristanî-çîmenê tevkariyê li sarkirina jîngeha herêmê dike û jîngeh û çavkaniya xwarinê ji hemû niştecihên wê re peyda dike. Di destpêka Şerê Cîhanê yê Duyemîn de, Sûriye wek çavkaniyeke baş a daristanê dihat dîtin.

Digel vê, dora 60 sal berê, xebat û çalakiyên mirovan dest bi bandoreke mezin li ser herêma bakurê Sûriyê kir. Siyaseta yekçandî hate sepandin. Li gorî vê siyasetê li deverê tenê cureyek çandiniyê hate kirin. Ji bo çandina genim, ceh û pambû, Bakurê Rojhilatê Sûriyê hate hilibjartin. Her wiha gav bi gav makîneyên çandiniyê hatin herêmê û ev jî bû sedem ku pêvajoya çandiniyê bileztir bibe û her wisa li deverê zeviyan daristanê yek bi yek winda bûn. Her ku cî ji daran re nema û hejmara daran kêmtir bû, zincîra xwarinê şikest û zirarê gihîşt te-

vahiya ekosîstema herêmê. Piraniya ajalên neteweyî jîngehên xwe winda kirin û di ketin rewşeke pir xeternak.

Berê ji bo kal û pîrên herêmê ku temenê wan li ser 60-70 salî ne, dîtina heywanên kovî tiştêkî gelekî asayî bû. Lêbelê, anihî li wir heywanên kovî pir kêmtir dîtin. Tiştên ku ev kesên extiyar li ser pîrrengiya biyolojîk a li herêmê vedibêjin, ji bo nîşanê wêkî çîrokek xeyalî xuya dike.


Bi rabûna qata darê û tunebûna daristanan, ajalan çavkaniya erzaqê û jîngeha xwe winda kirin û ajalên kovî heyrîrî û bêparastin man. Her wiha zincîra xwarinê jî şikest û nîşanê hin heywanên din ên li herêmê winda bûn. Hejmara hin cureyan jî li herêmê zêde bûn. Ji bilî pîrgirêkên çandiniyê yê girêdayî vê nehevsengiya hawîrdorê, wek windabûna hin cureyan, li

deverê nexweşî derketin û belav bûn.


Ev wêneya 2an Paşveçûna ekosîstema hin ajalan piştî rakirina qata darê ji bakurê Sûriyê nîşan dide.

Alektorîs, genimê Kurdan, qûmê tacdar, kew, hudhud/dawidê dunikil, têtî, hamsterê Sûrî, jûjîyê tîravêj, baz, başok, ker, berazên kovî, keftar, gur û pezkovî heywanên tîpîk bûn ku li bakurê Sûriyê dijîyan. Wekî ku di wêne 3an de tê nîşandan.

Çalakiyên mirovî û ji destdana qata kesk li bakurê Sûriyê bûye sedem ku çûkên koçber ên demsalî rêya xwe biguherînin. Çûk destpê dikin ku ji Sûriyê dûr bikevin. Vê yekê bûye sedema bandorên mezin ên hawîrdorê, nemaze bi pîrrengiya biyolojîk û hevsengiya ekosîstemê ve girêdayî ye.



Mînakek ji guherîna zincîra xwarinê li bakurê Sûriyê di navbera 1970-2022an de.



Ajalên hevpar ên ku li bakurê Sûriyê serdest bûn

Hemstera Sûrî navê xwe ji Sûriyê girtiye. Rêjeya erdnîgariya wan a xwezayî bi herêmeke biçûk a ziwa ya bakurê Sûriyê û başûrê Tirkîyê ve sînorkirî ye. Hejmara wan li çolê ji ber windabûna jîngehê ji çandiniyê û rakirina bi zanebûn ji hêla mirovan ve kêm dibe. Ji ber vê yekê, hamsterên Sûrî yên kovî niha ji hêla Yekîtiya Navneteweyî ya Parastina Xwezayê ve wekî xeternak têne hesabandin.


Sembola netewî ya Sûriyê baz e. Di navbera şênîyan de weke teyrê azad tê zanîn. Gel, weke sembola azadiyê bi kar tîne. Lêbelê çalakiya mirovî û zirara li ser jîngeha Sûriyê bû sedem ku ev teyr ket xeterê û dibe ku koç bike.




Baz, Sembola Sûriyê


Kewalîng sor bi Kurdî dibêjin “Kew, kev, kewk, kevî û kevkî.” Çûka ling sor hêlînên xwe bi gezgezkan çêdikin, li cihên bilind an jî di nava giyayên dirêj de hêlînên xwe datînin. Ji bo veşartin û parastinê wê yekê tercîh dikin. Ev çûk berê li bakurê Sûriyê dihatin dîtin. Lê ji ber ku herêmê êdî qata xwe ya kesk winda kiriye, ev çûk jî ji jîngeh û hêlînên xwe bûne û îro li herêmê kêm têne dîtin.


Hûn dikarin zêdetir hûrgûlfîyan li ser malperên me bibînin:

 treesagainstpoverity.org

 [TreesAgainstPoverty](https://www.facebook.com/TreesAgainstPoverty)

 [tree_vs_poverty](https://twitter.com/tree_vs_poverty)

 [company/trees-against-poverty](https://www.linkedin.com/company/trees-against-poverty)

 [treesagainstpoverity](https://www.instagram.com/treesagainstpoverity)



MIROVAHÎ GERDÛNA XWE DIAFIRÎNE:

METAVEVERSE

ÇI YE?
KÊRÎ ÇI TÊ?

DIGIKURD



Metaverse an jî gerdûna ferazî, gerdûneke çêkirî ye ku bi temamî ferazî ye. Metaverse konsepteke 3D ango dîmenên 3 alî ye û ev dihêle ferazî be jî alemekê bê afirandin. Metaverse pêşeroja înternetê ye. Înternet jiyaneke klasîk a 2D pêşkêşî mirvahiyê dîke û mirov tenê dikare bibîne. Lê metaverse derfeta jiyana ferazî ya înternetê dide.

Ev alem hêj bi temamî ne ketiye jiyana me lêbelê gelek platform hene ku ji niha de ev derfeta metaversê pêşkêşî mirovahiyê dikin.

A niha jiyaneke nêzî metaversê di lîstikên vîdyoyî de hene. Di lîstikên 3D'yê de mirov xwe weke li alemekê din hîs dîke û ev hîs gelek nêzî jiyana li metaversê ye. Metaverse kêm zêde dişibe wî rengî.

Helbet armanc û bendewariya ji metaversê ne tenê lîstik in, metaverse bi hebûna xwe wê înternetê bi taybetî alema ferazî ji nû ve biafirîne.



Her çiqas bingeheke tékûz tunebe jî teknolojiya krîptoyê dika-re metaversê serbixwe bike. Lewra teknolojiya blockchainê derfe-ta bênavendiyê dide. Bi saya blockchainê şexş û karakterên li ser metaversê bi rîya NFT'yan hêsan e bîn afirandin û tescîlkin. Tokenên krîpto him bi teknolojiya xwe bi jî bi ekosîstema xwe pergalên herî nêzî metaversê ne.

Bawerî û ewlehiya teknolojiya blockchainê ji bo metaversê rîya herî bêpawer e.

A niha gerdûnên nêzî metaversê li ser sepanên blockchainê aktîf in. Axie Infinity lîstîkên 3D dihewîne. Wekî din Second Life, Sand-Box û Decentraland pêşengên îro yê metaversê ne. her çiqas li ser bingeheke hevpar nehatibin danîn jî ev sepanên jor bi çend alîyan ve şemayeke nêzî metaversê pêşkêşî mirov dikin.

Îro gelek şîrketên teknolojiyê dixwazin tevî trêna metaversê bibin. Facebook jî dixwaze pêşengiya vê dike. Şîrketê navê xwe ji bo vê teknolojiyê wek META guhertiye. Ev gav her çiqas wek gaveke binavend bê qabûlkin jî ji bo pêşxistina alema metaversê gelek girîng e.



Metaverse wê bi kêrî çî bê?

Metaverse dikare jiyana hemû mirvahiyê di alemeke ferazî de bi hevdu re girê bide. Ev têgeh li ser şemaya 3D'yê ango dîmenên 3 alî ava bûye. Di destpêka şoreşa înternetê de WEB ji bo gelek kesan toreke tevlihev bû û gelekani hiş jê nedibir. Îro em metaversê jî dikarin wisa bi nav bikin.

Metaverse wê bibe şemaya 3D'yê ya malperên îro. Wek mînak li şûna ku têkevin malperekê hûn ê karibin li ser jiyana metaversê herin dikan an jî sazîyên ferazî.

Mirov wê karibin li ser gerdûna metaversê kopyaya heman jiyana rastîn çêbike. Bêyî ku ji cihê xwe rabin mirov wê karibin biçin hemû dinyayê bigerin.

Peyva "metaverse" cara ewil di pirtûka Neal Stephenson a honaka zanîstî ya bi navê Snow Crash (1992) ê de derbas bûye. Wê demê jî alema ferazî fikreke xeyalî bû û hêj îro jî wisa ye. Lêbelê teknolojiya îro dikare vê xeyalê rast bike.



Di bingeha metaversê de wê her şexsek xwediyê avatarekê be û ew bi rastiya ferazî karibe avatara xwe bi rê ve bibe. Bo nimûne, hûn ê karibin di mala xwe de tenê bi berçavkeke VR tevî civînan bibin û li wê derê fikr û ramanên xwe bilêv bikin. Wekî din hûn ê karibin biçin bankekê û ewraqan îmze bikin.

Bi teknolojiya NFT'yê mirov wê karibe ji xwe re karakter, erd, xanî bikire yan jî danûstandinê bike.

NFT ne tenê transferkirina çend wêneyan e, NFT wê karibe di metaversê de roleke sereke bileyze û xwedîtiya objeyên ferazî tescîl bike. Helbet teknolojiya blockchainê wê avakirina alemeke metaversê him ewletir him jî yekane bike.

Îro gelek pereyên krîpto hene ku xizmeta Web3'ê didin. Bi saya barkirina daneyan a li ser blockchainê wê dane jî ewletir bibin.

Bi kurtasî îro hêj alemeke yekbûyî ya metaversê tunebe lê di pêşerojê de wê jiyana asayî bi temamî pê biguhere.



PÊŞNÛMAYA AŞTÎYÊ (2-3)

Ji Farisî: ZANA ZENGENÎ, 2016

m.zana47@gmail.com

Pêşnûmaya Aştîyê (2)

Şehîdê li ser axê paldayî,
dî dilê xwe de got:
“Ger serfirazî têkbirina dijmin be,
wê gavê çima hîn dijminahî dewam dike?”

Pêşnûmaya Aştîyê (3)

Şehîdê li ser axê paldayî,
serê tilfya xwe di xwîna xwe de dadikir
û dinivîsî çend herf li ser kevîr:
“hêvîya serfirazîya rastîn;
ne di şer de,
lê li dijî şer e!”

| Qeyser Emînpûrê Lorî

Koma Kovargerên Kurd

Koma Kovargerên Kurd bi hêvîya kovargerên kurd bîne ba hev, bingehêka sazgehîyê bide kovargerîya kurdî, kovargerîya kurdî hem bi sêwirandinê hem bi naverokê bi pêş da bibe û pirsgirêkên kovarên kurdî bi hev ra çareser bike hatîye damezirandin.

Kovarên Endam



[W](#) [T](#) [F](#) [I](#) [Y](#) /KovargerênKurd
[✉ KovargerênKurd@gmail.com](mailto:KovargerênKurd@gmail.com)

The **Hall** Kurdî
Endama Koma Kovargerên Kurd e